## Peyama Desteya Kargêrî a PDKÎ bo kongira 9 an a Yêkitiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê

Sibêdeha roja Înê 28ê Xermanana 1404a Rojî, bi beşdariya dehan nûnerên hilbijartî li kobnferansên Yêkitiya Ciwanan, 9 mîn Kongireya Yêkitiya Ciwanên Dêmokrat ên Rojhilatê Kurdistanê li jêr navê "Ciwanên Derwest" û bi durûşma "Li pêxema komkirina hêza ciwanên Rojhilatê Kurdistanê li tev meydanên xebatê" de dest bi karê xwe kir û bi şanaziyê ve em radigehînin ku heta demjimêrên şevê ya hemen rêkeftê......

Dom»R:5




*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (502)22-09-2025 Buha (1000) Tûmen*



## peyamakakMistefa Hicrî bi hilkefta salvegera terorkirina Dr. Şerefkendî

33 sal berî niha û li 26ê Xeramanana sala 1371a Rojî, Dr. Seîd Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, digel Fetah Ebdulî, Endamê Komîteya Navendî û nûnerê Hizbê li derveyî welat, Homayûn Erdelan, nûnerê Hizba Dêmokrat li welatê Alman û herwisa Nûrî Dêhkurdî, dostê Hizbê, li bajarê Berlînê, ji aliyê rêjîma terorîstiya komara îslamiya Îranê ve hatine şehîdkirin.

Dom» R:2



## Şoreşa Jînayê, Dengê Kurdistanê li dijî Faşîzm û Kolonyalîzma Îranê

3 sal bi ser destpêkirina serhildana "Jînayê" de li Kurdistanê derbas bûn. Serhildanek ku bi cangorîtiya Jîna Emînî re li Têhranê ji aliyê hêzên rêjîma dagirkar a Îranê ve dest pê kir û di demeke kurt de ji sînorên Kurdistanê derket û tevahiya Îranê girt û bû serhildaneke mezin li dijî dagirkar. Ev serhildan ne tenê protêstoyek li kolanan bû, belku werçerxaneke dîrokî bû ku nîşan da çiqas nakokî, dabeşbûnên kûr ên netewî, zayendî û çînayetî li Îranê hene û ew zulm dikarin refek nû li dijî dagirkariyê, wate berxwedaneke mezin biafirînin.

Dom» R:7

# Yêkitî û hevxebatî remza serkeftinê ye




Gelek caran di dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd de, ev gotin hatiye ser zimanan ku sedemê sereke ya evê ku heya niha em Kurd negeheştine maf û azadiyê û me nekariye qedera xwe bigirne dest xwe, nebûna tebayî û yêkitiya di navbera me Kurdan û bi taybet hêz û aliyên xebatkar ên Kurd de bûye.

Hêzên siyasî û xebatkar ku bi kiryar di qada têkoşînê de ne, û renge heçî kîjan ji wan hêzan gorî felsefa avabûn û armancên xwe li ser bingeha îdolojiyekî taybet serî hildabin û dest bi xebatê kiribin, gelek ji wan dehan sale weke hêza naskirî di nava gel de xwediyê bandor û hitbara taybet bi xwe bin, mixabin heta niha heçî kîjan ji wan tenê di nava bazna îdolojî û stratêjiya taybet bi xwe de xebitîne.

Bi wî avayî hêz û şiyana xebata gelê me etomîze bûye ku ev jî daxwaz û xweziya dijmin û dagîrkerên Kurdistanê ye.

Ger ev gotinên serve bi avayekî giştî tev hêzên Kurdî li hemî perçan de li xwe digre, hêzên xebatkar û siyasî li Rojhilatê Kurdistanê jî cuda nînin ji vê xala nerênî, û heya niha bi sedemên cuda nekarîne aliyê kêm li ser çend xalên hevpar, yêkitî û hevxebatiyekê çêbikin, ger mînakên weke Navenda Hevkarî a Hêzên Siyasiye Rojhilatê Kurdistanê jî li derbasbûyî de hebûne û gelek jî bandor hebûye û weke hêza yêkgirtiye siyasî kariye bibe sedemê dilgermî û hivya nava gel, mixabin li ber nebûna stratêjiyekî xwedî bingeh û qahîm di navbera wan hêzên beşdar li vê navendê de, karê wê gelek dewam nekiriye.

Hekî gotî ya heya niha çoyî, êdî ço, bila hêzên xebatkar ên Rojhilatê Kurdistanê aliyê kêm bo îropêde cehd û hêza xwe bikne yêk bo çêkirina yêkitî û hevxebatiyekê, da ku hem hiviyê bi de gel, hem hêza xebatê çend qat zêdetir dibe, hem di qonaxa niha de ev yêkitî û hevxebatî ji heçî demê zedetir hewceye.

Aliyê kêm li ser hin pirsên hevpare wek, mafê çarenivîsa netewî, azadî, dêmokrasî, hilbijartina pêşerojê, rêzgirtin ji baver û cudahiyên hevdu, pirsa Xak û niştîman, û şêwazên xebatê bi dijî rêjîma dagîrker û .....

Niha bas heye ku di rojên bê de konfiransek bi beşdariya 7 hêzên siyasî ên Rojhilatê Kurdistanê li Alman de pêk bêt, Hizba Dêmokrat ku baverekî kûr bi yêkitî û hevxebatiya di navbera hêzên Kurdî de heye û gelek jî bo vê armancê cehd kiriye, bi çavê hiviyê ve dinêre vê konfiransê û ragihand ku encamên vê kombûnê dê mizgênîder û cihê hivya gel be.

Lewra zûbin hindî direng nebûyî




## Şerefkendî rêberê rewşê

Dom » R:8



## Bîranîneke kurt ji Dosiyeya Mîkonosê

Dom » R:9

# Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokarat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 26ê Xermananê, salvegera terorkirina Dr. Şerefkendî, peyamek belav kir

**Deqa peyamê wiha ye:**

33 sal berî niha û li 26ê Xeramanana sala 1371a Rojî, Dr. Seîd Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, digel Fetah Ebdulî, Endamê Komîteya Navendî û nûnerê Hizbê li derveyî welat, Homayûn Erdelan, nûnerê Hizba Dêmokrat li welatê Alman û herwisa Nûrî Dêhkurdî, dostê Hizbê, li bajarê Berlînê, ji aliyê rêjîma terorîstiya komara îslamiya Îranê ve hatine şehîdkirin.

Hekî çi yêk ji adetên komara îslamiya Îranê jinavbirina fizîkî ya rêberên tevgera netewî-dêmokratîk li Rojhilatê Kurdistanê û têkoşerên vê rêbazê ye, lê berdewamiya tevgerê û xweragirî û canfidayiya têkoşerên rêya rizgarî û azadiya Kurdistanê, şikest bi siyasetên rêjîmê aniye.

Şehîd Dr. Seîd Şerefkendî, yek ji rêberên navdarê tevgera netewiya Kurdistanê û bi rastî cihgirê jêhatiyê Dr. Qasimloyê rêber, bi hejmarek taybetmendî û reftarên bilind û miroviya xwe wî pê avête nava rêbaza xebatê. Heta dema şehîdbûnê bi hejmarek pirensîpên şoreşgerane û zanayî û birêveberî û yekalîkeriya tevav, bi dîtingehek Kurdistanî û şirovekirinek zanistî û hûrbîn ku li dîroka Kurdistanê û tevgerên vê hebû, li ser berdewamî û parastin û biserxistina hêla hizrî û netewiya Dêmokratê de pêdagir û xwedîbandor bû.
Piştî 33 salan, li demekê de em yada şehîdên Mîkonosê bi bilind radigrin ku terorîzma hikûmiya rêjîma komara îslamiya Îranê, bo hilkêşana dawî nefesên xwe berxwedide, û dema tevpêçana temenê qirêje rêjîmê jî çavnihêrkirî û nêzîktir bûye.



Li vê hilkeftê de , ez bejna xwe li hember rêbaza şehîdên rêber diçemînim û soza berdewamkirina rêbaza wan nû dikin.

**Mistefa Hicrî**
**Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**16ê September 2025**

# Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta Sêyemîn salvegera şoreşa Jîna yê peyamek belav kir



**Mistefa Hicrî: Li şoreşa Jîna yê de eva ku serdestiya vê tê xuya, îradeya netewên mafxwaz bo guherîna rêjîmê ye**

**Deqa peyamê wiha ye:**

Sêyemîn salvegera şoreşa "Jîna"yê bi diruşma "Jin, Jiyan, Azadî", li rewşek taybet de ye. 3 sal piştî kuştina Jîna Emînî, Keçe Kurda Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê demûdezgehên tepeserker ên desthilata navendî ve, rewşa civaka Rojhilatê Kurdistanê û Îranê û herwisa rewşa desthilata navendî digel guherînên kûr û rewşeke nû rûberû bûye.

Qonaxa piştî şoreşa Jîna yê, ne tenê bo Kurdistanê, belku bo Îranê û heta deverê, xala guherînek mezin e.

Ji aliyekê pirsa jiyan û mafên jinan û nirxên azadî û kerameta tak û bi kom a netewên sitmemdîtî û hemû civaka Îranê li rojev û li rikeberiyek berdewam digel desthilatê de ne, ji aliyê dinê jî Rêjîma komara Îslamî li rewşa bonbesta siyasî û birêveberiyê û hilgirê hejmarek qeyranê çaresernekirî de ye û hekî hêza tepeserker û şerxwaz jî bê derxistin, şiyana birêveberî û manê, nemaye.

çarçoveyek mezintir a wan pirsgirêkan, hevdembûn digel rêkevtina rêjîmê û dijberên vê li 2 astên navxweyî û derve de ye, ji aliyekê xelkê Îranê û ji aliyê din ve civaka navnetewî ye.

Tepeserkirina berfireh a şoreşa Jînayê, ne tenê nekarî hêza netewên mafxwaz piştguh bixe, belku rikeberiya li navbera azadî û hêza tepeserker, berfirehtir kiriye û eva ku baladestiya xwe dide xuya, îradeya mafxwazî û azadîxwazan bo guherîna vê rêjîmê û avakirina Îranek azad û dûr ji tepeserî, hizra qurixkarî û înkarkirinê ye.

Li sêyemîn salvegera şoreşa Jînayê de , silavan dişînim bo jinan û ciwanên pêşeng û civaka hişmend û sunetşikên a Kurdistanê û tevahiya azadîxwazan û netewên mafxwazên Îranê.

Silava rêz û emegnasiya xwe oêşkêşî riha şehîdên şoreşa Jîna yê û malbatên serbilindên wan û birîndar û qurbaniyên vê tevgerê dikim.

**Mistefa Hicrî**
**Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**15ê Îlona 2025 a Zayînî**

# Daxuyaniya Desteya Kargêrî a PDKÎ bi hilkefta 33 mîn salvegera terora Dr. Şerefkendî û hevalên wî

**Xelkê xebatkar ên Kurdistanê!**
**Hêz û aliyên siyasî yên Kurdistanî û Îranî!**
33 sal berî niha û li 26ê Xermanan a sala 1371 a Rojî de, Dr. Sadiq Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, digel Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û Nûnerê Hizbê li derveyî welat, Homayûn Erdelan, Nûnerê Hizbê li welatê Alman û Nûrî Dêhkurdî, dostê Hizbê, li pîlaneke rêkxistinkirî ya komara îslamiya Îranê li bajarê Berlînê, hatine terorkirin.

Dezgeha Dad a Alman, piştî vê kiriyara terorîstî ya komara îslamiya Îranê ku dosye û dadgeha vê terora hikûmî ya komara îslamî, bi Mîkonosê hate navdêrkirin, piştî lêkolînek hûr li heyama 5 salan de bi lidarxistina 247 kombûnên dadgehê de û gazîkirina 176 kesan, biryara xwe ya dawî da. Pêka biryara dadgeha Berlînê, bi armancgirtina Dr. Sadiq Şerefkendî û qurbaniyên din ên vê bûyerê, terorkirinek siyasî û hikûmî ya komara îslamiya Îranê û bi biryara rasterast a karbidestên herî payebilind ên rêjîmê bûye. Hizba Dêmokrat her li vê demê de biryara Dadgeha Berlînê bilind nirxand ku tevî givaşên zêde yên siyasî, serbixweyiya xwe parast û bi eşkerekirina rastiyan, rûkê rast û terorîstiya komara îslamî bo civaka cîhanê da xuya.

Armanca rêjîma îslamiya Îranê li vê terorkirinê, bi encamgihandina kiryareke nîvetevav û encamvergirtin ji biryarekê bû ku çend sal berî hingê ji bilintrîn asta rêberiya rêjîmê de hatibû dan, Ev jî bi armancgirtina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bo şikestpêanîn bi xebat û xweragiriya Kurd, wek çepera dawî ya berxwedan û azadîxwaziyê li Îranê de bû. Biryarek ku pêştir bo terorkirina "Dr. Ebdulrehman Qasimlo" Sekreterê pêştir ê Hizba Dêmokrat hatibû dan û li jêr navê danûstandin bo boseya bajarê Viyenê hatibû kêşandin, Li dema karbidestên rêjîma îslamî zanîn ku Dr. Şerefkendî wek cihgirek xwedîşiyan ê hêja bo "Dr. Qasimlo" gelek bi başî valatiyên nebûna wî li rêberatiya Hizba Dêmokrat û tevgera Kurd te tejî kiriye, vê carê ev jî kirine armanc. Bêguman, terorkirina du Sekreterên bi wec û xwedîbandor ên Hizba Dêmokrat û piştre çalaktirkirina maşîna teror a rêjîmê li Başûrê Kurdistanê bo bi armancgirtina kadr û pêşmerge û xebatkarên Hizba Dêmokrat, nîşanderê tirsa rêjîmê li xebat û şûndaneriya vê Hizbê û îşarekirinek rohntir, bo bêhêzkirina Hizbê û tevgera Kurd li Îranê bû.

Tevî ku terorkirina du Sekreterê Giştî yên Hizba Dêmokrat li heyama 3 salan de derbek giran bi Hizba Dêmokrat bû, lê hevçeper û qutabiyên wan du rêberên xwedîşiyan li meydana xebata rizgarîxwaziyê de selimandine ku ev tevger û xebata rewa, çavkaniya vê ji hundir û hinawên civaka Kurdistanê ve bûye û heta dem derbas bûye, zêdetir geşe kiriye . Ev jî girêdayê geşeya hizir û bîra azadîxwazî û hivî û dûrdîmena tak û kom a civaka Kurdistanê bo gihîştin bi mafên mirovî û netewî ye. Dîtingehek ku bi hûrî û bi rohnî li şirovekirina Rêberên Şehîd ên wek "Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî" û birêveberên vê Hizbê de xwe daye xuya.

Dr. "Sadiq Şerefkendî", rêberek jêhatî, hilkişiyayî bi bejna Pêşmergeyane, akademîsiyenekî hûrbîn û şoreşvanekî xwedî bawer û xwedî pirensîpe siyasî û netewî bû. Dr. Sadiq Şerefkendî kesayetiek biryarder û yekalêker bi tevavetiya wateya vê bû. Wî li birêveberiya Hizba Dêmokrat de pêdagirek tevav li ser hêla hizrî û teşkîlatiya Hizbê dikir. Dr. Şerefkendî li hemû heyama xebat û tekoşîna xwe, mijûliyeta hizriya wî ya herî mezin berfirehtirkirina zêdetir a tevgera siyasî û netewiya Kurd li Îranê bi piştrastbûn bi piştevanîkirin û xwetêdedîtina zêdetir a xelkê bû. Kêm ji nivîs û gotarên Dr. Şerefkendî hene ku li wan de daxwaz ji xelkê nekiribe ku tevgerê, ya xwe bizanîn û piştevanîkirina li tevgera siyasî û netewiya xwe, berfirehtir bikin û hewce ye ku hemû çîn û qatên civakê li hember çarenivîsa gel de xwe bi berpirsayar bizanin.

Dr. Sadiq Şerefkendî li pêgeha akademîsiyenek serkevtî de girîngiya herî zêde bi aliyê teorîk û dîroka tevgera Kurdistanê û pirsa rewa ya vê dida û bi nivîsîna pirtûk û goratan, dîtingeh û awirên xwe li derheq pirsa netewî û çareserkirina pirsa Kurd, şirove dikirin. Bi taybet li nêzî dema herifîn a dîwarê Berlînê û hilveşîna Yekîtiya Soviyetê û dawîhatin bi ducemserî û şerê sar û li berdewamiya vê şêwaza serbixwe û rexnegirane de ku bi salan li nav Hizba Dêmokrat de û bi destê rêberên wek Dr. Qasimlo, hatibû binyatîkirin, şiroveyek nû û bi wec li rewşa nû de dikir. Li pêwendî digel pirsa netewî, dîtingeha Kurdistanî ya diyarîkirî hebû. Bi hizra vî, Kurd wek civak û Kurdistan wek niştimanek dabeşkirî, xwediyê nasnameya netewî û nasnameya taybet bi xwe ye. Wî bi şarezayî û şirovekirinek kûr ku ji dîroka Kurd û tevger û serîhildanên Kurdistanê hebû, giringiyek taybet bi nasnameya netewî û pirsa nasnamenasînê dida.

Ev taybetmendiya Dr. Şerefkendî wiha kiribû ku digel avakirina her cure alî û lihevkirinek digel aliyên Îranî, pirsa mafên netewî bi binyat û pêşmerc bê vergirtin û beşek bingehîn ji gotara siyasî ya vî rêberên mezin e. Lê ev binyat, nebû sedema piştguhavêtina pirsên hestiyar û biha û nirxên demdirêj ên din ên wek pirsa dadperweriya civakî, sitema çîn û qatan û pirsa jinan û ... hd.




Li derheq rola civaka Rojhilat û çîn û qatên cuda û beşdariya wan li tevgera çendîn alî ya Rojhilatê Kurdistanê, dîtingehek taybet bi xwe hebû, tevî giringîdan bi xebata pêşmergane û berevaniya rewa û çekdarî, wa hizir dikir ku xebata çekdarî, dîtingehek e û her wekî hatiye gotin "bo xebatkirinê, çi zafe rê" û li encamê de pêdegirî li ser hewcehiya beşdarbûn a hemû çîn û qatên civaka Kurdistanê li tevgerê de dikir.

Dîtingehek din a Dr. Sadiq Şerefkendî, tekezîkirin bi ser pirsa serbixweyiya siyasî ya Hizba Dêmokrat bû û bi bi berdewamî pêdegirî bi ser dikir ku "Em bi xwe, siyaseta xwe diyarî dikin, ja çi Hizbek biçûk bin an mezin, çi bi hêz bin an bêhêz, siyaseta serbixweyiya xwe naguherin, çimkî em Hizbek serbixwe ne". Herwisa li pêwendî digel çarenivîsa netewa Kurd li Rojhilat de pêdegirî li ser kirarbûn a netewa Kurd dikir û hizir dikir ku bi tenê kurd bi xwe dikare biryarê li ser çarenivîsa xwe bide.

Taybetmendiyek dine bilind a Dr. Şerefkendî, dîtingeha bihevnêzîkirina hêzên opozîsiyon û dijberên komara îslamiya îranê li ser binyata pirensîpên neguher ên Hizba Dêmokrat wek mafê netewî û mijara dêmokrasiyê bû. Li vê pêxemê de jî gelek hewl dan ku serwetir li asta aliyên Îranî de, pirsa Kurd li asta rêkxirav û komelên cîhanî de bîne berbas û naveroka pirsa Kurd û rûkê rastîn ê rêjîma komara îslamî bi raya cihaniyan bide nasandin. Mixabin li dawî hewlên xwe de û piştî beşdarîkirin li kongireya Înternasyonal Sosyalîst de bi armanca çêkirina platformek hevpar digel aliyên Îranî, bû armanca terorîzma hikûmî ya komara îslamiya Îranê û hate şehîdkirin.

33 sal bi ser terorkirina rêberê jêhatiyê me re derbas dibe, digel berdewambûn û li rewşa geşekirina tevgera netewî û giştiya Kurd li Rojhilatê Kurdustanê, Hizba Dêmokrat li ser hêla netewî û nirx û pirensîpên siyasiyên xwe û rêberên xwe yên şehîd, pêdegir e. ev yeka bi berwajiyê vê hizrîn û armancên gemar ên komara îslamî ye ku niha jî wa hizir dike ku bi rêya terorkirin û komkujiyê û "Nêimeta şer li Kurdistanê", Hizba Dêmokrat û tevgera netewî, dê ji nav bibe. Her wek dibînin ku tevî wan hemû derbên ku ji aliyê terorîzma komara îslamî ve bi Hizba Dêmokrat kevtine, ev Hizba nek her ji nav neço, belku hizra netewî û azadîxwaziya Kurdistanê û pirsa rewa ya vê, bi berdewamî geşe kiriye û berfirehtir bûye.

33 sal piştî terora Mîkonosê, îro li asta giştî û civakên li cografiyaya Îranê de hêz û xwesta netewên bindest û herêmên netewî yên bi dûr ragirtî li paşeroja rikeberiyan de, bûne hêzeke xwedî bandor. Li asta desthilatê de rêjîm digel zincêreyek qeyranên tevaliyayî yên siyasî, aborî, civakî û birêveberiyê ve rûberî bûye ku derbasbûn ji wan qeyranan bo rêjîmê gelek zehmet e. Li asta deverî û navnetewî de terorîzma hikûmî ya komara îslamî bi hemû tor û hêzên milîsn xwe nek her roj bi roj bêhêztir dibe, heta niha kûrahiya bêhêziyê û bêçaretiya rêjîmê li her demekê zêdetir tê xuya. Zêdexwazî û xoseriyên li jêr navê şandina şoreş û girngîdan bi bernameya navkî û mûçekî û alozkirina aramiya deverê digel asteng û lemperên mezin rûberû bûye û li gelempera wan guherînên navxweyî û deverî de komara îslamiya Îranê êdî nikare xwe rabigre.

33 sal piştî terora Mîkonosê, ev rastiya ji her demekê zêdetir tê xuya ku ceribandina xebata dûr û dirêj lê dewlemend a Kurdistanê ku li çend salên derbasbûyî de tevgera Jînayê ji mînakên vê yên berçav bû, ev ceribandin wênaya birêkevtina hêz û nirxên azadî, mafê jiyan û kerameta mirov û netewan li hember ceribandina şikestxwarî ya navendgirayî û qurixkariyê ye. Lewma li salvegera terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevrêyên vî de bi morelek bilind û bi hêviyê ve rêbaza pîroz a vî şehîdê mezin didomînin û binyat û reftar û waneyên vê rêberê mezin, her meşxela ronîderê rêya xebata me be. Hevdem li ser binyata mafên netewî û demokratîk û avakirina Îranek demokratîk û federal, tekezî bi ser hevxebatî û vekheviya hemû netewên bindest û hêz û aliyên azadixwaz dikin.

Silav li rihê paqijê Şehîdên Kurdistanê
Silav li îradeya giştî û seha xweragirî û xebatkariya xelkê Kurdistanê

**Hizba Dêmokrat a Kurdiatan Îranê**
**Desteya Kargêrî**

# Daxuyaniya Desteya Kargêrî a PDKÎ, bi hilkefta sêyemîn salvegera şoreşa Jîna yê

**Li sêyemîn salvegara tevgera Jîna "Jin Jiyan Azadî" yê de**

Sê sal berî niha û li rojên dawî yên heyva Xeraman a 1401 a Rojî de, şehîdbûna Keçek Kurd a ciwan a bi navê "Jîna Emînî" ya xelka bajarê Seqizê bi destê tepeserkarên rêjîma komara îslamî ya Îranê li bajarê Têhranê, bû çexmaqê serhildan û tevgerek berfireh a nerizayetiyê ku berfirehiya vê bala cîvaka navnetewî û heta dewletan jî bo aliyê xwe rakêşand.
Tevger ku li 26ê Xermananê li goristana "Ayçî" ya bajarê Seqizê li dema bi axêspartina termê Şehîd Jîna yê de bi amadebûna hezaran kes ji xelkê deverên Kurdistanê dest pê kir, bi hilgirtina diruşma "Jin Jiyan Azadî" peyamek tejî wate û mana ji Kurdistanê ve bo Îran û hemû cîhanê belav kir.
Tevgerek ku bi armancgirtina tevahiya rêjîma komara îslamî, gelek zû karî li asteke berfireh a giştî de bi beşdariya piraniya nêzî bi tev çîn û qatên civaka Kurdistanê, keçan, jinan, bazarî û kasibkaran, ciwanan û qutabî û xwendekaran, mamostayên olî yên welatparêz û …hd, sînorê welatan derbas bike û li ser şeqamên Ewropayê û li kom û civînên navnetewî de xwe da xuya.
Tevî ku bingeh û cihê serîhildana tevgerê û diruşmên Kurdistanê û yekem banghêjî yên mangirtin û xwenîşandanan li ser daxwaziya Navenda Hevkarî ya Hizbên Kurdistana Îranê bûn, lê piştevanîkirina xelkê bajar û deverên cuda yên Îranê li tevgera Jîna û Kurdistanê hate meydanê bi diruşma "Kurdistan çav û çiraya Îranê" hem gurûtêneke taybet da tevgerê û hem komara îslamî rastî tengasiyên zêdetir kir û herwisa zêdetir bala civaka cîhanî jî xiste ser.
Li hember de komara îslamî wek naverok û reftara xwe ya hertimî di cihê bixwedeçon û rêzgirtin li îradeya xelkê û daxwaziyên rewaye wan ku azadî û dabînkirina mafên wan ê dêmokratîk e, bi şêwazek sîstematîk û bi şêwazeke herî dirindane, êrîş kire ser xwenîşanderan. Li encama êrîş û tepeserkariya hêzên rêjîmê de, sedan şehîd, hezaran kes birîndar û her pêka îtirafkirinên karbidest û navendên fermî yên rêjîmê, dehan hezar kes jî hatine girtin û bo girtîgehên rêjîmê hatine veguhastin ku tevî bidarvekirina dehan kes ji wan ku heta niha jî berdewam e, bi hezaran girtiyên din bi nerewa, sizayên giran bi ser de hatine sepandin.
Tevgera Jîna yê tevî ku selimand Kurdistan pêşengê xebat bi dijî dîktatoriya rêjîma komara îslamiya Îranê û sekinîn li hember barimtegirtina maf û azadiya netewî ya xelkê Kurdistanê ji aliyê vê rêjîmê ve bû, encama pengurîn a kerb û bêzariya hemû xelk û gelên Îranê bû ku zêdetir ji 4 dehikan e, daxwaziyên wan ên siyasî, ji aliyê desthilata sitemkar û navendgira ya Îranê ve bi dirindanetirîn şêwazê bersiva vê dide û tê tepeserkirin. Tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê ku piştî şoreşa sala 1357 a Rojî, bi berfirehtirîn û bi giştîtirîn tevgera mafxwazaneya gelên Îranê tê hisêb û jin û ciwanan rola bingehîn tê de hebûn û nêzî 2 heyvan berdewam bû, li pêvajoya tevgerên civakî de xala guherînek taybet bû ku her wek îşare pê hate kirin, zêdetirîn bala kom û civatên navnetewî jî bo aliyê xwe rakêşad.
Li tevgera Jînayê de civaka Kurdistanê û tevgera siyasiya vê, navenda balkêşandinê bû, Lewma li odeyên reş ên biryardan û dariştina pîlanan a rêjîma Îranê de biryar hate dan ku xelkê Kurdistanê û Hizb û aliyên siyasiyên vê, bikin armanc û hevdem digel êrîşa tepeserkarane bo ser xelkê şoreşvan ên ser şeqamên Kurdistanê, li 6 ê Rezbera 1401 a Rojî de spaha pasdaran a rêjîmê, li kûrahiya axa Herêma Kurdistanê de bi mûşekan êrîş kire ser binke û bargehên Hizbên Rojhilatê Kurdistanê û dehan kes ji kadr û pêşmerge û heta jin û zarok jî şehîd kirin.
Armanca rêjîmê ji wan êrîşan ku piştre 2 carên din jî li heyva Xezelwerê de dubare bûn, xapandina raya giştî ya xelkê Îranê û ji şiyanxistin a Hizban li pêywendî digel tevgerê bû. Lê eva ku piştî piştevanîkirina gelên din ên Îranê li xelkê Kurdistanê û bilindbûna dengên hizban li navxweyê welat de qewimî, da xuya ku rêjîm ne tenê bi şikestxwarî derket, belku da xuya ku yekgirtina li navbera gelên Îranê û pêgeha Hizbên Rojhilatê Kurdistanêbi taybet Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê- li nav xelkê de çend qahîm û cihgirtî ye.
Naverok û taybetmendiyên modern û demokratîk ên tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê û peyam û durûşmên modern ên tevgerê ku sedema bingehîn a rakêşana raya giştî ya cîhanî bûn, derfetek dîrokî bo tevgera mafxwazane ya gelên Îranê li asta navnetewî de afirand. Bilî ku şeqamên welatên Ewropayê ku diyasporaya Kurd û Îranî û aliyên dijberên rêjîma komara îslamî bo heyama çend heyvan kiribûn bi meydana piştevanîkirin li xelkê navxweyê welat û gihandina deng û peyama tevgerê bi xelkê cîhana azad û şermezarkirina serkutkariyên rêjîmê, derî û korîdorên bo kor û kombûnên cur bi cur ên navdewletî û navnetewî bo bihîstina deng û peyamên tevgera Jînayê vekirin.
Niha ku yada sêyemîn salvegera destpêkirina tevgera jîna yê ye û em bas ji derfetên li ber destê tevgera Jîna û tevgera dehan sale ya gelên Îranê bi dijî komara Îslamî ya Îranê dikin, nebûna yêkitiyê li navbera hêz û aliyên opozîsiyon û nebûna alternatîvek bihêz ku karîba û şiyana avakirina desthilatek gelî û demokratîk cih bigre, kêmasiyek bingehîn û sehpêkirî ye.
Li vê derheqê de Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî îşarekirin bi vê xala bingehîn a kêmasiya tevgerê û eniya opozîsiyonê li ser nebûna alternatîvê û jidestçona derfetan, berpirsiyarane li pêxema piştevanîkirin li naverok û bingeha tevgera Jîna yê û rawestan li hember jirêderxistina armancên vê ji aliyê kêmîneyek qurixker, helwîst girt û eşkere rû bi xelkê Kurdistan û gelên din ên Îranê, îşare bi metirsiyên pêvajoyên tevaviyetxwaz bo ser armancên tevgerê kir.
Tevî ku tevgera Jîna yê bi sedema siyaseta tepeserkerane a rêjîmê û hejmarek sedemên din ên bingehîn ku îşare pê hatine kirin, nekarî bigihîje armanca xwe ya sereke ku herifandina rêjîmê û bidestveanîna desthilatek demokratîk a gelî bû, lê tevî ku serîhildan wek xala guherîna dîrokî bû, tevgera mirovperweraneya xelk û gelên Îranê, çendîn pêngaw pêş xist û desthilata serberedayî û navendgiraya Îranê jî rastî aloziyek ji nerewabûna vê xwe kir.
Komara îslamî ya Îranê li tevgera Jîna yê ve heta niha jî ne tenê her nekariye birîna berfirehtirbûna qelişîn û dûrketina xwe ji xelkê çareser bike, belku ev navbera heta dem derbas dibe berfirehtir û kûrtir dibe. Lewma



tevgera Jîna yê û armancên vê li hizra hemû xelk û gelên Îranê de bi zindî maye û dê li derfetekê de serî hilde.
Rêjîma komara îslamî ya Îranê ku piştî bûyerên 7ê Octobera 2023 a Zayînî û şerê 12 roje digel Îsraîlê de li warê hêz û pêgeha deverî, rewatiya navxweyî, naveroka xwe ya îdolojîkî, gotara xwe de rastî şikest û navbetalbûnê hatiye, tirsa bingehîna vê derencamên tevgêra Jîna yê û serîhildana nerizayetiya xelkê ye ku vê carê jê rizgarbûn bo rêjîmê dê gelek dijwar û zehmet be.
Bi baldan li xalên bihêz û kêmasiyên tevgera Jîna yê, li ser Hizb û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê erk e ku tevî parastina destkevtan û peyrewî û piştevanîkirin li şêwazên xebatek modêrn û serdemî ya giştgîr û girseyî, hewceye biwêrane şaşî û kêmasiyên xwe bibînin û rêgirî ji jidestçona derfetan bikin.
Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ku li pêvajoya tevgera Jîna yê de û hem piştre jî cehda destnîşankirina derfet û gefên bi ser vê tevgerê de daye û li hember her cure qurixkirin û gefek bo ser Kurdistan û tevgera vê ya rewa sekiniye, li ser vê baweriyê ye ku çêkirina yekgirtinê li navbera hêzên Kurdistanî digel hev û piştre, pevre digel bereya opozîsiyona rêjîmê li navxwe û derveyî welat e ku dikare armancên tevgera Kurd û gelên din ên Îranê bi dest ve bîne.
Li sê saleya vê tevgerê de tevî bilind û pîrozragirtina yada hemû şehîdên tevgera Jîna yê, em silavan li malbatên serbilind ên şehîdên vê tevgerê dikin ku heta niha jî bi hilkeft û hêcetên cur bi cur, li hember siyasetên rêjîmê de sekinîne û bi bîranîna şehîdan, tevgera "Jin Jiyan Azadî" li hizir û yadan de bi zindî hiştine.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**

# Peyama Desteya Kargêrî a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bo kongira 9 an a Yêkitiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê

**Ciwanên Rojhoilatê Kurdistanê!**

**Endam û alîgirên Yêkitiya ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê!**

**Rêkxistin û damezraveyên Ciwanên Kurdistanê!**

Sibêdeha roja Înê 28ê Xermanana 1404a Rojî, bi beşdariya dehan nûnerên hilbijartî li kobnferansên Yêkitiya Ciwanan, 9 mîn Kongireya Yêkitiya Ciwanên Dêmokrat ên Rojhilatê Kurdistanê li jêr navê “Ciwanên Derwest” û bi durûşma “Li pêxema komkirina hêza ciwanên Rojhilatê Kurdistanê li tev meydanên xebatê” de dest bi karê xwe kir û bi şanaziyê ve em radigehînin ku heta demjimêrên şevê ya hemen rêkeftê, kongireya me bi serkevtiyane dawî bi karê xwe anî.

Kongireya nû ya Yêkitiya Ciwanan li rewşeke tevav dêmokratîk û li ser binyata gotûbêjên rohn, hejmarek biryar û pêspartiyên nû bo qonaxa nû ya xebat û tekoşîna me, pesend kir û herwisa endamên nû yên birêveberî bo qonaxa nû ya tekoşîna rêkxiranê hilbijart û piştre bi koma dengên birêveberiya hilbijartiya Kongireyê, rêzdar “Bêhzad Qadirî” wek Sikirtêrê nû yê rêkxiravê, hate hilbijartin.

**Rêzdaran!**

Nehemîn Kongireya Ciwanên Dêmokrat ên Rojhilatê Kurdistanê li demekê de bi rê ve ço ku rewşa deverê û navdewlatî, bi lezgînî li guherînê de ye û ev guherîn jî karlêkeriyek berfireh ne tenê bi ser Îranê, belku bi ser tevahiya wan welatan heye ku Kurdistanê bi ser wan de hatiye parvekirin.

Bi balkêşandin bo ser pêşhatên vê dawiyê yên li Rojhilata Navîn û Îranê, bi taybet piştî tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê li Rojhilatê Kurdistanê ku rola karlêker û bi bandor û pêşengiya ciwanên ser şeqamên Kurdistanê da ber çavan tê dîtin ku paşeroja me rohn û li hemû waran de derfetên zêrîn dê hebîn, û derfeta bo çalakî û tevgerê û serîhildanek nû ji her demekê amadetir e.

Li naha de rêjîma îranê tûşî dehan qeyranên curbicur bûye û ew qeyran li Rojhilatê Kurdsitanê, berfirehtir in.

Rewşa netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ku serdestiya hizra şuwênîstiya navendê bi ser de ye, ev pirs bi tevavî ji beşên din ên Îranê cuda kiriye û vê yêkê jî wisa kiriye ku şêwaza xebata me, aliyên cur bi cur li xwe bigre û derfetên siyasî û medenî û meydanî ji dest nedin û xebatek afirankarane ber bi pêş ve bibin.

Ji aliyek din bandora tevgerên navxweyê Îranê û bi taybet li Rojhilatê Kurdistanê wek: Tevgera Jînayê, tevgera baykotkirina şanoya hilbijartinan û tevgera Newrozê, ji aliyek din jî wan givaşên deverî û navnetewî, rêjîm rastî dijwartirîn qonaxa xwe kiriye.

Vê yekê jî deriyê hemû eger û derfetek bo tevgera rizgarîxwaziya Kurd û netewên din, vekiri ye. Vê yekê hewcehî bi rêkxistina refên netewa me bi taybet ciwanan heye.

Kongireya 9 an a me, ev derfeta afirand ku rewşeke dêmokratîk de bo qahîmkirina armanc û bernameyên xwe û herwisa pêdeçon li rêkxistinên Yêkitiya Ciwanan, biryarên qedersaz bidin.

Şerê 12 roje yê li navbera Îran û Îsraîl û êrîşa rasterast a Amerîka bo ser binkeyên navkî yên Îranê û jinavçon û bêhêzbûna milîsên ser bi rêjîmê li deverê de dide xuya ku rêjîma komara îslamî, her çi qas ku li asta navnetewî de paşekêşî pêhatiye kirin û desthilata vê wek caran nemaye, lê hêj li tepeserkariyên xwe bi dijî Rojhilatê Kurdistanê, her berdewam e.

Rijdkirina givaşên bo ser çalakiyên ciwanan û çalakvanên medenî û siyasî ji aliyê dezgeha tepeserker a rêjîmê û hewldan bo kontrolkirina jiyana rojane ya xelkê li civakê û çona nav hemû aliyên jiyana rojane ya xelkê, wêneya vê hikûmeta dîktator û qorixkariya vê tîne ber çavên me ku berî herifînê, ev şêwaz li ber xwe girtibûn lê şiyana rawestan li hember îradeya giştî nebûn.

Her heyamekê berî niha ku şoreşa nû ya gelê Nêpalê bi rêberatiya ciwanên şoreşvan bi ser kevt û hikûmeta qurixker û sansorker a vî welatî li demek kurt de hate herifandin.

**Ciwanên tejî hêza Kurdayetiyê!**

Xebata netewî-dêmokratîk a Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, hilgirê çemkên wek rizgarîxwazî, nasnamexwazî, dêmokrasî, şaristaniyet û pevrejiyanê ye û xwediyê rast ê wan çemkan, neteweyekî rêkxistinkirî bi hizra “J.K” û Hizba Dêmokrat û Komara Kurdistanê ye ku rêkxirava Ciwanan wek mîratgirê vê serweta mezin e, biryar daye ku tevî micidbûn li ser wan nirx û pirensîpan, dost û berdengên zêdetir bo xwe peyda bike.

Qonaxa nû ya xebatê de emê bi tekoşîna rêkxiravî û komîserhevkirina hêz û şiyana wan ciwanan li hemû meydanên xebatê de, rijd bikin û dest li nav destê hev bo yek armancê emê bixebitin.

Emê bixebitin ku sîbera sitemek netewî û civakî bi ser Kurdistan û ciwanên Kurd nehîêlin û serbestiyê bi dest xwe ve bînin.

Li dawiyê de em serê rêzê li hember wan hemû şehîdên ku li qonaxên cuda de li refa Yekîtiya Ciwanên dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê de xebat kirine, ditewînin.

**Serkeve xebata rizgarîxwaziya netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê**

**Serkeve Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê**

**Kongireya 9 a Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê**

**19ê Îlona 2025 a Zayînî**

# Kongireya 9 mîn a Yêkitiya Ciwanên Demokrat a Rojhilatê Kurdistanê bi serkeftiyane bi dawî hat

Sibêdeha roja înê 28ê Xermanana 1404an a rojî, 9 mîn Kongireya Yêkitiya Ciwanên Demokrat a Rojhilatê Kurdistanê, li jêr silogana " Ciwanên Derwest" dest bi karên xwe kir û piştî rojekê ji karê berdewam dawî bi karên xwe anî.
Di despêkê de Kongire bi sirûda Netewiya " Ey Reqîb" ûbîstek bêdengî bo rêzgirtin li rihê paqij yên tev şehîdên rêya rizgariya Kurd û Kurdistanê destpê kir.
Piştire peyama despêka Kongirê ji aliyê rêzdar " Rehman Selîmî" Sekretêrê berê yê Yêkitiya Ciwanan ve hate xwendin.
Herwisa peyama Desteya Kargêrî a Hizbê ji aliyê rêzdar " Mistefa Mewlûdî " Cihgirê Sikirtêrê giştî ê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ve pêşkeş bi beşdarbûyên Kongireyê hate kirin û tevî hêvîxwestin û serkeftin bo Kongireya 9 mîn a Ciwanan, behs liser rola girîn a Ciwanan di nav civatê û piştevaniya desteya Kargêrî û rêberiya Hizbê li rêkxirava Ciwanan wekî rêkxiravekî çalak û tejî hêz dubare kir.
Deste gulek ji aliyê desteya Kargêrî a hizbê ji aliyê rêzdar " Kawe Behramî " Endamê Desteya Kargêrî û berpirsê Navenda Hêza Pêşmergê Kurdistanê ve bi nûneratî li endamên kongireya Yeketiya Ciwanan, pêşkeş bi rêzdar " Pêşewa Elîpûr" sikirtêrê berê vê rêkxiravê hate kirin.
Di beşek din de rêzdar " Simaîl Şerefî" Berpirsê Rêkxiravên medenî yên Rojhilatê Kurdistanê tevî pêşkeşkirina deste gula pîrozbahî bi kongirê, peyamek rû li beşdarbûyên kongirê pêşkeş kir.
Pêşewa Elîpûr Sekretêrê berê ê rêkxiravê û endamê rêberî yê hizba Demokrat, peyama xwe pêşkeş kir û behsek li rewşa Ciwanan li Rojhilat, asta Yeketiya Ciwanan li kor û komên navnetewî, rewşa neasayî ya kongirê, rewşa Ciwanan li navxweyî welat û civatgehê de kir û tekezî liser berdewam bûn li xebata Ciwanan bo bidestxistina mafê Ciwanan û mafê netewî kir.
beşek din a karê kongirê hatibû terxankirin bo nîşandana dîkomêntariyek dîrokî bo nîşandana dîroka Ciwanan ku ji aliyê beşa ragehandina rêkxirava Yeketiya Ciwanan ve hatibû amadekirin.
Di beşek din de peyamên berçav yên rêkxirav, û kesayetiyên Kurdistanî, deverî û Navnetewî ku bi mebesta pîrozbahî li Kongireya 9 an a Ciwanan hate parvekin.
Herwisa peyama Yeketiya navnetewî a Ciwanên Întêrnasyonala Sosyalîst bo berşdarbûyên Kogirê hate xwendin.
Piştre wergirtina dengê " Rewayî" bi kongirê, 9 mîn Kongireya Ciwanan dest bi karê xwe kir.
Piştî berhevdan û behis kirin û pêşniyar, rexne, têbînî û rayên cuda, biryarname û bername û peyrewa navxweyî a Yeketiya Ciwanan hate pesenind kirin.
Di beşa dawiyê a karê kongirê li pêvajoya hilbijardinek azad, nihênî û Demokratîk de bi serperestiya Navenda Hilbijartina hizbê ve, birêveberiya eslî û cêhgir hatine hilbijartin.



Herwisa birêveberiya nû a Yeketiya Ciwanan hilbijardeya 9 mîn kongireya li yekemn civîna xwe de, bi piraniya dengan " Bêhzad Qadirî " wekî sekretêrê Yeketiya Ciwanan hilbijartin.

# Daxuyaniya dawîhatina kongireya 9 an a Yêkitiya Ciwanên Dêmokrat ên Rojhilatê Kurdistanê

**Ciwanên Rojhoilatê Kurdistanê!**
**Endam û alîgirên Yêkitiya ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê!**
**Rêkxistin û damezraveyên Ciwanên Kurdistanê!**

Sibêdeha roja Înê 28ê Xermanana 1404a Rojî, bi beşdariya dehan nûnerên hilbijartî li kobnferansên Yêkitiya Ciwanan, 9 mîn Kongireya Yêkitiya Ciwanên Dêmokrat ên Rojhilatê Kurdistanê li jêr navê "Ciwanên Derwest" û bi durûşma "Li pêxema komkirina hêza ciwanên Rojhilatê Kurdistanê li tev meydanên xebatê" de dest bi karê xwe kir û bi şanaziyê ve em radigehînin ku heta demjimêrên şevê ya hemen rêkeftê, kongireya me bi serkevtiyane dawî bi karê xwe anî.
Kongireya nû ya Yêkitiya Ciwanan li rewşeke tevav dêmokratîk û li ser binyata gotûbêjên rohn, hejmarek biryar û pêspartiyên nû bo qonaxa nû ya xebat û tekoşîna me, pesend kir û herwisa endamên nû yên birêveberî bo qonaxa nû ya tekoşîna rêkxiranê hilbijart û piştre bi koma dengên birêveberiya hilbijartiya Kongireyê, rêzdar "Bêhzad Qadirî" wek Sikirtêrê nû yê rêkxiravê, hate hilbijartin.

**Rêzdaran!**
Nehemîn Kongireya Ciwanên Dêmokrat ên Rojhilatê Kurdistanê li demekê de bi rê ve ço ku rewşa deverê û navdewlatî, bi lezgînî li guherînê de ye û ev guherîn jî karlêkeriyek berfireh ne tenê bi ser Îranê, belku bi ser tevahiya wan welatan heye ku Kurdistanê bi ser wan de hatiye parvekirin. Bi balkêşandin bo ser pêşhatên vê dawiyê yên li Rojhilata Navîn û Îranê, bi taybet piştî tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê li Rojhilatê Kurdistanê ku rola karlêker û bi bandor û pêşengiya ciwanên ser şeqamên Kurdistanê da ber çavan tê dîtin ku paşeroja me rohn û li hemû waran de derfetên zêrîn dê hebîn, û derfeta bo çalakî û tevgerê û serîhildanek nû ji her demekê amadetir e.
Li naha de rêjîma îranê tûşî dehan qeyranên curbicur bûye û ew qeyran li Rojhilatê Kurdsitanê, berfirehtir in. Rewşa netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ku serdestiya hizra şuwênîstiya navendê bi ser de ye, ev pirs bi tevavî ji beşên din ên Îranê cuda kiriye û vê yêkê jî wisa kiriye ku şêwaza xebata me, aliyên cur bi cur li xwe bigre û derfetên siyasî û medenî û meydanî ji dest nedin û xebatek afirankarane ber bi pêş ve bibin.
Ji aliyek din bandora tevgerên navxweyê Îranê û bi taybet li Rojhilatê Kurdistanê wek: Tevgera Jînayê, tevgera baykotkirina şanoya hilbijartinan û tevgera Newrozê, ji aliyek din jî wan givaşên deverî û navnetewî, rêjîm rastî dijwartirîn qonaxa xwe kiriye. Vê yekê jî deriyê hemû eger û derfetek bo tevgera rizgarîxwaziya Kurd û netewên din, vekiri ye. Vê yekê hewcehî bi rêkxistina refên netewa me bi taybet ciwanan heye. Kongireya 9 an a me, ev derfeta afirand ku rewşeke dêmokratîk de bo qahîmkirina armanc û bernameyên xwe û herwisa pêdeçon li rêkxistinên Yêkitiya Ciwanan, biryarên qedersaz bidin.
Şerê 12 roje yê li navbera Îran û Îsraîl û êrîşa rasterast a Amerîka bo ser binkeyên navkî yên Îranê û jinavçon û bêhêzbûna milîsên ser bi rêjîmê li deverê de dide xuya ku rêjîma komara îslamî, her çi qas ku li asta navnetewî de paşekêşî pêhatiye kirin û desthilata vê wek caran nemaye, lê hêj li tepeserkariyên xwe bi dijî Rojhilatê Kurdistanê, her berdewam e.
Rijdkirina givaşên bo ser çalakiyên ciwanan û çalakvanên medenî û siyasî ji aliyê dezgeha tepeserker a rêjîmê û hewldan bo kontrolkirina jiyana rojane ya xelkê li civakê û çona nav hemû aliyên jiyana rojane ya xelkê, wêneya vê hikûmeta dîktator û qorixkariya vê tîne ber çavên me ku berî herifînê, ev şêwaz li ber xwe girtibûn lê şiyana rawestan li hember îradeya giştî nebûn. Her heyamekê berî niha ku şoreşa nû ya gelê Nêpalê bi rêberatiya ciwanên şoreşvan bi ser kevt û hikûmeta qurixker û sansorker a vî welatî li demek kurt de hate herifandin.

**Ciwanên tejî hêza Kurdayetiyê!**
Xebata netewî-dêmokratîk a Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, hilgirê çemkên wek rizgarîxwazî, nasnamexwazî, dêmokrasî, şaristaniyet û pevrejiyanê ye û xwediyê rast ê wan çemkan, neteweyekî rêkxistinkirî bi hizra "J.K" û Hizba Dêmokrat û Komara Kurdistanê ye ku rêkxirava Ciwanan wek mîratgirê vê serweta mezin e, biryar daye ku tevî micidbûn li ser wan nirx û pirensîpan, dost û berdengên zêdetir bo xwe peyda bike.
Qonaxa nû ya xebatê de emê bi tekoşîna rêkxiravî û komîserhevkirina hêz û şiyana wan ciwanan li hemû meydanên xebatê de, rijd bikin û dest li nav destê hev bo yek armancê emê bixebitin. Emê bixebitin ku sîbera sitemek netewî û civakî bi ser Kurdistan û ciwanên Kurd nehêlin û serbestiyê bi dest xwe ve bînin.
Li dawiyê de em serê rêzê li hember wan hemû şehîdên ku li qonaxên cuda de li refa Yekîtiya Ciwanên dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê de xebat kirine, ditewînin.

**Serkeve xebata rizgarîxwaziya netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê**
**Serkeve Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê**
**Kongireya 9 a Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê**
**19ê Îlona 2025 a Zayînî**

## Nerîna



**"Miștefa Hicirî":**

**"Hekî çi yêk ji adetên komara îslamiya Îranê jinavbirina fîzîkî ya rêberên tevgera netewî-dêmokratîk li Rojhilatê Kurdiștanê û têkoşerên vê rêbazê ye, lê berdewamiya tevgerê û xweragirî û canfîdayiya têkoşerên rêya rizgarî û azadiya Kurdiștanê, şikest bi siyasetên rêjîmê aniye"**




**"Donald Trump":**

**" Ez li hember Rûsiyê, dê berevanî li Lehiștan û welatên Baltik bikim"**



**"Binyamîn Netanyaho ":**

**" Hewce ye em bereya Îranê ji nav bibin, ev li şiyana me de ye"**




**"Rafael Grossi" :**

**Hewldanên dîplomatîk ji bo çareserkirina nakokiya li ser bernameya navikî ya Îranê di "qonaxeke dijwar" de ne."**

# Şoreşa Jînayê, Dengê Kurdistanê li dijî Faşîzm û Kolonyalîzma Îranê



**N. Eskender Ceiferî**



3 sal bi ser destpêkirina serhildana "Jînayê" de li Kurdistanê derbas bûn. Serhildanek ku bi cangorîtiya Jîna Emînî re li Têhranê ji aliyê hêzên rêjîma dagirkar a Îranê ve dest pê kir û di demeke kurt de ji sînorên Kurdistanê derket û tevahiya Îranê girt û bû serhildaneke mezin li dijî dagirkar.

Ev serhildan ne tenê protêstoyek li kolanan bû, belku werçerxaneke dîrokî bû ku nîşan da çiqas nakokî, dabeşbûnên kûr ên netewî, zayendî û çînayetî li Îranê hene û ew zulm dikarin refek nû li dijî dagirkariyê, wate berxwedaneke mezin biafirînin.

Lê pirsa sereke dimîne: çima şoreşek ku bi dirûşmeya gerdûnî ya "Jin, Jiyan, Azadî" dest pê kir, nekarî bibe sedema serkeftinê û hilweşandina rêjîma dagirkar a Îranê? Bersiva vê pirsê nikare tenê di tepeserkirinê de were kurtkirin. Divê em li kûrahiya dîroka kolonyalîst a navxweyî ya Îranê, berdewamiya projeyên navendîparêz û ji nû ve hilberandina faşîzma modêrn jî binêrin.

Tevgera Jînayê li herêmên Kurdistan, Belûçistan û Ehwazê rastî şêweyên herî hovane yên tepeserkirinê hat. Bi sedan cangorî, bi hezaran birîndar û girtinên berfireh nîşan dan ku Îran van herêman wekî "koloniyên navxweyî" dibîne.

Wan neteweyên nefars hertim qurbanî û cangorî ji bo berxwedanê dane. Hertim di kevana serhildana Jînayê de li van herêman bû ku dirûşmeyên radîkal pêk dihatin. Ew jî diruşmên ji bo serxwebûnê bûn.

Wan diruşmeyan nîşan dan ku ji bo neteweyên bindest, pirsgirêk ne tenê "azadiya takekesî" an "rêforma siyasî" ye, belku tevgera wan têkoşînek radîkal li dijî kolonyalîzmê û ji bo mafê diyarkirina çarenûsê ye.

Berevajî vê, li Têhran û navendê de, asta daxwazan bi piranî di çarçoveya diruşmeya "jin, jiyan, azadî" de ma. Vê cudahiyê dabeşbûnek kûr eşkere kir. Ew jî ev e ku neteweyên ne-Fars nedixwestin ji dagirkarekî derbas bibin û dagirkarek din bê ser kar.
Yek ji faktorên herî girîng ên bêhêvîbûnê, hewldana hin mêdyayên Farsî yên li derveyî Îranê bû ku alîgiriya Pehlewî dikirin. Berevajî diruşmeya modêrn, fêmînîstî û azadîxwazane ya "Jin, Jiyan, Azadî", wan diruşmeyek baviksalar û neteweperest a Farsperest çê kir ku ev jî "Mêr, Welat, Avedanî" bû.

Ev nakokî bi hilkeft nebû. "Jin, Jiyan, Azadî" ne tenê sloganek e, lê felsefeyeke rizgarîxwaz e ku ji tevgerên Kurdî tê û girîngiyê dide azadiya jinan, wekheviya neteweyan û jiyana azad. Berevajî vê, slogana "Mêr, Welat, Avedanî" heman pergala baviksalar û navendî ya Têhranê ducarî dikir. Ew jî êzikek e ku tê de mêr wekî sembolên hêzê, welat wekî amûrek ji bo asîmîlasyonê û avedanî wekî perdeyek ji bo talan û newekheviyê ye.

Ji bo Kurd, Belûç, Ereb û Tirkmen ew ji bilî berdewamiya kolonyalîzma Îranê tiştek din nîn e.
Di 100 salên borî de, ew neteweyên nefars qurbaniyên polîtîkayên asîmîlasyonê û tepeserkirina çandî ji aliyê rêjîma Îranê ve bûne. Qedexeya hînkirina zimanê wan ê dayikê, wêrankirina aboriya van herêmên ne-Fars, talankirina çavkaniyên xwezayî û darvekirina çalakvanên siyasî tenê beşek ji vê projeya kolonyalîzma navxweyî ne.

Jîna, keça Kurd, bû sembola vê dîroka dirêj a zilmê. Ew ne tenê qurbaniya hicaba bi zorê bû, lê belê qurbaniya sîstmeke kolonyalîst bû ku ev sed sal in li ser neteweyên ne-Fars hatiye ferzkirin.
Tevgera Jîna nîşan da ku beşek mezin ji opozîsyona navendî ya Farsan hîn nekariye ji vegotina "Îraneke yekgirtî" derbas bibe. Gelek ji van hêzên Farsan, an daxwazên neteweyên ne-Fars paşguh dixin, an jî bi eşkereyî li dijî wan disekinin.
Di pratîkê de, li şûna ku piştgiriyê bidin berxwedana li Kurdistan, Ehwaz û Belûçistanê, ev hêz pir caran bi bêdengiya xwe an jî bi helwêstên radîkal pişta rêjîmê digirin. Lewma neteweyên bindest pê hesiyan ku heke pişta xwe bi Farsan germ bikin, ewê ji bo hilweşandina dîktatoreke kolonyalîst bên qurbanîkirin, lê di dawiyê de ji hêla yekî din ve dîsa rastî dagirkariyê bên.
Tevî ku Şoreşa Jînayê nebû sedema hilweşandina rêjîma Îranê jî, lê belê ew tevger di eşkerekirina rûyê rastîn ê kolonyalîzma Îranî û faşîzmê de ku di bin kevlê opozîsyona navendî de veşartî ye, serketî bû. Ev ne destkeftek piçûk e.
Şoreşa Jînayê nîşan da ku bêyî naskirina mafên neteweyên Kurd, Belûç, Ereb û Tirkmen û bêyî bidawîkirina dîroka kolonyalîzma navxweyî li Îranê, ti guhertineke mayînde pêk nayê.

Jîna navek e ku îro ne tenê li Îranê, belku li tevahiya cîhanê wekî sembola berxwedanê tê naskirin. Jîna, wate jiyan. Di rastî de wateya rastîn a wî navî tenê wê demê tê fêmkirin ku dengê neteweyên bindest bê bihîstin. Pêşeroja Rojhilata Navîn bêyî Kurd, Belûç, Tirkmen û Ereban nayê nivîsandin. Her projeyek siyasî ku wan neteweyan paşguh bêxe, dê têk biçe. Şoreşa Jînayê ev rastî eşkere kir ku guhertina rastîn tenê ji dilê naskirina pirrengî û mafên wekhev ên hemî neteweyan pêk tê.

Şoreşa Jînayê ne tenê serhildanek siyasî bû, belkî tevgerek bû ji bo ji nû ve pênasekirina azadiyê li Rojhilata Navîn. Vê tevgerê nîşan da ku azadiya rastîn bêyî bidawîkirina kolonyalîzma navxweyî û bêyî azadkirina jinan ji serdestiya baviksalariyê, çê nabe.

Tevgera Jînayê bîranînek tijî xwîn û berxwedanê ye, lê di heman demê de sembola daxwaza azadiyê ya neteweyekê ye ku êdî naxwaze ji dîktatorekî dagirkar derbasî dîktatorekî din ê dagirkar bibe. Dengê Kurdistan, Belûçistan, Tirkemensehra û Ehwazê, îro dengek cîhanî ye, dengek ku ti hêzek nikare wê bêdeng bike.

# Şerefkendî, rêberê rewşê



N. Mecîd Heqî




Di sala 1989an de, dengê guleyekê ne tenê sekreterê giştî yê partiyekê bêdeng kir, lê di heman demê de tevgerek di nav bêbaweriyê de hişt. Navê wî nas e: Dr. Qasimlo.

Lê pirsa yekser ev bû: Kî dikare vê şokê derbas bike û di heman demê de stratejiyê biparêze? Bersiva dîrokê: Dr. Seîd Şerefkendî. Ger em bixwazin wî bi zimanê rêveberiya îroyîn bixwînin, divê em biçin “seroktiya rewşî”, heman teoriya ku dibêje ku serokekî bi bandor şêwazek sabît tune ye, lê di navbera rêberiya biryardar, rahênan, piştgiriya beşdar û delegasyona berpirsiyar de diguhere, li gorî rewş û amadebûna hêzan.

Di kêliyek şokê de, rêxistin hewceyê “zelalkirinê” ne. Şerefkendî pêşîniyên tavilê zelal kirin: parastina yekîtîya siyasî, berdewamiya rêxistinkirina Pêşmergeyan, û zindî hiştina dengê partîyê. Ev qonaxa “seroktiya biryarder” e, ku divê kar pêşde biçe û xet divê zelal bin. Lê ew li wir nesekinî.

Ew zû ji fermandariyê ber bi razîkirinê ve çû: Çima pêdivî ye ku em li ser rêyê berdewam bikin? Em çawa dikarin hem xeta pêşîn biparêzin û hem jî çîrokek hevpar biafirînin? Ev veguherîn ji fermandariya tenê ber bi ravekirin û motîvasyonê ve ew e ku serokê rewşê di nîvê krîzekê de dike.

Yek ji îmzeyên Şerefkendî girêdana sê cîhanên cûda bi hevdu bû: têkoşîna bajarî, berxwedana çiyayan, û dengê dîyasporayê.

Ji perspektîfa seroktiya rewşê ve, ev piştgiriya beşdarbûnê hewce dike, dema ku hêz xwedî kapasîteya çalakiyê ne lê hewce ne ku werin bihîstin û beşdarî biryaran bibin da ku li hev bikin û nasnameyê parve bikin.

Dilsozî, piştgirî, coş û karîgerî - çar taybetmendiyên ku alîgirên wî jê re dibêjin - tam amûrên vê şêwazê ne: ew têgihîştina xelet kêm dikin, enerjiyê diafirînin, û baweriyê ava dikin. Encam? Nebûna Qasimlo ji refên partiyê “naye hîskirin”.

Eger vîzyon neyê nûjenkirin, ew ê kevnar bibe. Şerefkendî di asta “stratejîk” de rahênerî kir: wî wate û rêwerz da, sedemên wê rave kir û zimanekî hevpar afirand. Lê di asta “rêveber” de, wî erk da tîmên gihîştî: desthilatdarî li qadê, hesabdayîn li navendê.

Ev hevsengiya pêşniyarkirî di serokatiya rewşê de ye: li cihê ku jêhatîbûn û gihîştîbûnek mezintir hebe, bêtir erkdarkirin, li cihê ku nelihevhatin an nezelalî hebe, rahênan û piştgirî.

Ji ber vê yekê berxwedan dikare berdewam bike û vegotina yekgirtî ji hev neket. Serokatiya rewşê ne tenê “qutiyek amûran a şêwazan” e, ew di heman demê de exlaqek têgihîştinê ye. Divê rêber bi berdewamî rewşê binirxîne: tîm di çi astê amadebûnê de ye? Ma erk zelal e an nezelal e? Zexta derveyî li ku ye? Bersiv şêwaza îro diyar dikin: carinan ferman ji bo pêşîgirtina li şemitîna biha, carinan piştgirî ji bo tamîrkirina girêdanan, carinan razîkirin ji bo lihevhatina taktîkan bi stratejiyê re, û carinan erkdarkirin ji bo lez û xwedîtiyê.

Vegotina wan sê salan nîşan dide ku Şerefkendî ev çerxe dizanibû: ji yekbûnê ber bi hêzkirinê ve. Nivîskarê van rêzan bi rexneyekê re hevdeng e ku di nivîsên salvegerê de jî tê dubarekirin: “ramanên stratejîk” ên ku Şerefkendî xurt kir piştî şehadeta wî bi têra xwe nehatin saz kirin. Ev pêlava Axîl a gelek tevgeran e: dema ku serokatî tê kêm kirin û nabe “pêvajoyek”, çerxa fêrbûnê dema ku ew diçe rastî kêmasiyan dibe.

Çareserî? Standardkirina teşhîsê (em çawa amadebûna hêzê dipîvin), destnîşankirina protokolek şêwazan (kengê ferman bidin? kengê piştgirî bikin? kengê radest bikin?), û ciddî girtina plansaziya cîgirtinê; veguheztina “zanîna rewşê” ji hişê takekesî bo bîra rêxistinê.

**Ji bo îro fêrbûna pratîkî**

- Di krîzê de, pêşî erkê ronî bike. Pêşanîyên tavilê, demên diyarkirî, rol. Piştre, îqnakirin û vegotin.
- Nasnameyeke hevpar ava bikin. Ger hêza we hebe lê empatî tune be, şêwazek piştgiriyê ya hevkar vebijarkek çêtir e.
- Kar bidene karnasan. Tîmên gihîştî berpirsiyariyê dixwazin. Bêyî ku berpirsiyariyê berdin, emanet bikin.
- Belge bikin. Teşhîs, biryar û pîvanên ji bo guhertina şêwazê binivîsin da ku ew “li dû kesê” bimîne.

Belkî pênaseya herî baş a Şerefkendî ev e: mîmarê hevsengiyê. Hevsengiya di navbera fermandarî û diyalogê de, di navbera piştgirî û daxwaza encaman de, di navbera navenda stratejiyê û qada pêkanînê de. Wî nîşan da ku di rewşên herî dijwar de guhertina şêwazê bêyî ku armanc ji bîr bibe mimkun e.

Ger em dixwazin ji wan sê salan dersek ji bo niha fêr bibin - li şûna ku poşman bibin ji windakirinê - divê em “seroktiya rewşî” ji teoriyek polê veguherînin adetek rojane ya biryardanê: têgihîştin, hilbijartina şêwazê, sererastkirin; dîsa û dîsa.

Salveger ne ji bo şînê ne; ew ji bo fêrbûnê ne. Werin em fêr bibin ka meriv çawa bi serkêşiya biryarder krîzek dest pê dike, meriv çawa bi piştgiriya beşdarbûnê têkiliyan ava dike, meriv çawa bi rahênanê wateyekê diafirîne, û meriv çawa rêxistinê bi rêya delegasyonê ji takekesî mezintir dike.

Ew dem e ku girêdana bajar, çiya û dîyasporayê - ew projeya ambicioz ku Şerefkendî carekê damezrandiye - êdî bi navekî yekane ve girêdayî nabe; Ew bi şiyana kolektîf ve girêdide.

Ev versiyona rojnameyê ya dersek kevin e: serokatî ev e ku meriv bi berdewamî rêjeya rêberî û piştgiriyê, tam li gorî şert û mercan, sererast bike.

# Bîranîneke kurt ji Dosiyeya Mîkonosê



N. Serbest Urmiye

Terorkirina Sikirtêrê giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê li xwaringeha Mîkonosê li Berlînê (17ê Îlona 1992an) di dîroka siyasî ya serdem a Rojhilata Navîn û Ewropayê de xala guhertineke nû bû. Ev sûc, ku bi fermana rasterast a berpirsên herî pilebilind ên Komara Îslamiya Îranê hat kirin, ne tenê neyarên rejîma Îranî li Ewropayê de hatin kuştin, belku di heman demê de têkiliyên Têhran-Ewropayê jî rastî krîzeke bêhempa hat.

Di dosiyeya Mîkonosê (1993–1997) de bo cara yekem bû ku di dîroka serdem de, pergaleke siyasî bi fermî bi "terorîzma dewletê" were mehkûmkirin. Di dosiye û dadgeha han de, ji bilî biryarên fermî û darizandina sîstema terorê ya rejîma Îranê, komek ji rastiyên negotî û destên veşartî jî eşkere bûn ku didan xuya kirin ka dadperwerî çiqas bi berjewendiyên jeopolîtîk, aborî û nihênî ve hatiye girêdan.

### 1. bingehên dîrokî û siyasî

Piştî şoreşa 1979'an, Kurdistana Îranê bû qada pevçûnên bi xwîn di navbera Komara Îslamî û partiyên Kurdî de. Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi serokatiya Dr. Ebdulrehman Qasimlo û piştî wî jî Dr. Sadiq Şerefkendî, hêza herî girîng a opozîsyona çekdarî û siyasî bû. Ji destpêkê ve, siyaseta Komara Îslamî li ser bingeha tunekirina fizîkî ya rêberên Kurd bû: Dr. Qasimlo li Vîyen ê (1989) û sê sal şûnda, Şerefkendî û hevkarên wî li Bêrlînê hatin teror kirin.

Terorkirina dijberan li derveyî welêt bû stratejiyeke dewletê. Bi sedan çalakvanên siyasî yên Kurd, çepgir, neteweperest … li Ewropayê û Rojhilata Navîn bûen armanc. Lê girîngiya Mîkonosê di wir de bû ku teror li ser axa Alman hatibû encam dan, welatek ku nekarî li hember wê dozê de bê deng bisekine.

### 2. Pîlan û cî bi cî kirina terorê

Di belgeyên dadgeha Berlînê hate xuya kirin ku biryara birêveçûna vê operasyonê ne di asta wezaretekê de, belkû di "Komîteya Karûbarên Taybet" a Konseya Bilind a Ewlekariya Neteweyî ya rejîma Îranê de hatibû dayîn, dezgehek ji Elî Xameneyî, Haşimî Refsencanî, Elî Felahiyan û Elî Ekber Welayetî pêk hatibû. Çarçoveya karê vê komîteyê ji bo tunekirina sîstematîk a dijberên rejîmê li hundir û derveyî welêt bû.

Operasyona tunekirinê spartin Wezareta Îtila'atê. Taqimek ji terorîstên Îranî, tevî hêzên Hizbullaha Lubnanê, ketin tevgerê û bi piştgîriya lojîstîkî ya balyozxaneya Komara Îslamî li Berlînê, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û hevalên wî terror kirin.

### 3. pêvajoya dosiyeya Mîkonosê

Dosiyeyê ji sala 1993 ve heta 1997 dom kir û bi sedan civînên dadgehê hatin lidarxistin. Şahid, pispor û gelek belge hatin pêşkêş kirin. Di dawiyê de, dadgehê cezayê hepsa heta hetayê da bersûcên sereke û ya girîngtir, ragihand ku: Ev teror bi fermana rasterast a Rêberê Komara Îslamî û berpirsên herî pilebilind ên hikûmetê yên wê demê pêk hat. Kuştina dijberan beşek ji siyaseta fermî ya Komara Îslamî bû, ne kiryarek xwe ser.

### 4. Rastiyên negotî û destên veşartî

Tevî ku biryarek dîrokî derket jî, dosiyeya Mîkonosê tejû ji rastiyên negotî bû ku rûmetê aloz yê dadperweriya cîhanî dane eşkere kirin.

#### 4.1 Bêdengiya bi zanebûn a Ewropayê

Her çend dadwerên doze berpirsên payebilind ên rejîma Îranî li gor belgeyên yasayî berpirsiyar dane zanîn, çi yek ji welatên Ewropayî ji bo darizandina wan li ser asta navneteweyî pêngavên micid nehavêtin. Sîbera Berjewendiyên aborî û girêdayîbûna Ewropiyan bi enerjiyê ya Îranê, prensîpên mafên mirovan veşartin .

#### 4.2 Rola torên ewlekariya Alman

Raport nîşan didin ku ewlekariya Alman (BND) û polîsên Berlînê berî ku terora han bê encamdan, sîgnalên xeterê wergirtibûn, lê ji bo parastina têkiliyên siyasî yên dewletî bi Têhranê re, xwe ji girtina rê û çareyên esasî parastine. Ev paşguhxistina han a bi zanebûn yek ji xalên reş ên herî mezin e li karnameya ewlehiyê li Almanyayê.

#### 4.3 Dîplomasî li pişt perdê

Di dema darizandinê de, danûstandinên veşartî di navbera rayedarên Îranî û Ewropî de pêk derketin. Ewropayê bi awayekî eşkere biryarek da, lê ji bo ku zirar ber têkiliyên aborî û ewlehiyê yên Ewropayê bi Têhranê re nekeve, ji şopandina biriyara xwe di qada navneteweyî de, xwe ragirt.



#### 4.4 Berjewendiyên aborî û jeopolîtîk

Almanya hevkarê bazirganî yê herî mezin ê Îranê li Ewropayê bû. girêbestên pîşesazî û enerjiyê bûne sebeb ku, heta piştî derxistina dîplomatên Îranî jî, car din têkiliyên qut kirî bi rejîma îranê re, di demek kurt de vegerin rewşa xwe ya normal. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û hêzên cîhanî jî ji ber hewcedariya xwe rola Îranê li Rojhilata Navîn de, rê nedan ku doza han derkeve qadên navneteweyî.

#### 4.5 Lawaziya Opozîsyonê

Dadgeha Mîkonosê dikarî ji bo opozîsyona Kurd û Îranî xaleke hevgirtinê be, lê lihevnekirin û rikeberiya hindur dengê wan fetisand ku di kiriyar de bi qazancê rejîma Îranê tevav bû.

### 5. Berhem

Ji bo Komara Îslamî: rû reşî di asta cîhanî de hate tomar kirin û bi dosiyeya Mîkinosê bi fermî wekî "terorîzma dewletê" ya rejîma Îranê hate selimandin, lê ji ber berjewendiyên aborî yên Rojava, cezayên ku bi ser rejîmê de hatibûn sepandin û dibû ku berdewam bin, di demeke kurt de bi dawî hatin .

- Ji opozîsiyona Kurd û Îranî re: tevî çinebûna piştivan û alozî û li hevnerkirina hindur, derfeteke zêrîn a dîrokî ji erî û mafên mirovan de zal in.

### 6. Girîngiya dîrokî û sembolîk

Dadgeha Mîkonosê berfirehtir bû ji doza tawana kuştinê. Darizandina han eşkere kir ku:

- terorîzm di Komara Îslamî ya Îranê de siyaset û naveroka dewletê ye.
- Bû xaleke grîng û xuya ya dîrokî di berheqbûna xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd de.
- Nîşan da ku dadperwerî di cîhanê de ne prensîpeke reha û cihê hitbarê ye, belkû meydana danûstandin û rikeberiyê ye di navbera zilhêzan de.

### Di dawiyê de

Terora Mîkonosê ne tenê tawan û sûcek bû, belkû danezanîneke eşkere ya siyaseta tunekirinê ya Komara Îslamî ya Îranê û rûreşiyek ji bo siyaseta Ewropayê bû.

Dadgeha Berlînê cara yekem pergaleke siyasî bi terorîzma dewletê mehkûm kir, lê destên veşartî ji Komîteya Karûbarên Taybet li Têhranê ve bigire heya dezgehên ewlehiyê yên Alman, ji berjewendiyên aborî yên Ewropayê ve bigire heya bêdengiya hêzên cîhanê, dane selimandiin ku dadperwerî di cîhana îro de sînordar, rêjeyî û bê hitbar e.

Dadgeh waneyek dîrokî bû bo tevgera azadiya Kurdistanê û opozîsiyona Îranî, dadperweriya cîhanî tenê di demekê de ku hêzên siyasî bikaribin dengê xwe bi awayekî yekgirtî, bihêz û berdewam bidin bihîstin, dikare misoger be.

# Ne tenê rejîma Îranê mafên mirovan binpê dike, belku hebûna vê rejîmê bi xwe binpêkirina mafên mirovan e



N. Elî Munezemî



Dr. Qasimlo dide destnîşankirin ku rejîma Îranê ji destpêka desthilatdariya xwe ve ji ber sê sedeman li dijî neteweya Kurd derketiye: (1) daxwaza Kurdan ji bo mafên neteweyî, ku wekî gefek li ser hêza yekgirtî û navendî ya Komara Îslamî dihat hesibandin, (2) têkoşîna Kurdan ji bo demokrasiyê, ku rejîmê wekî daxwazek "Rojavayî" bi nav kir û bi wî rengî dijî îdeolojiya Îslamî bû, û (3) piraniya Kurdan Misilmanên Sunnî bûn, olek ku ji Îslama Xumeynî cuda bû, û hem jî kurdan li dijî rejîmê çek hilgirtibûn.

Bi wî rengî analîza Qasimlo nîşan dide ku dijminatiya rejîmê li hember Kurdan ji xwezaya nemirovane ya rejîmê tê, ku li cem wê rejîmê îdeolojî û hêz li ser mafên gerdûnî û daxwaza gel ji bo azadiyê pêştir in.

Rêxistinên mafên mirovan bi hezaran caran kiryarên rejîmê - komkujî, îşkence, girtin, bidarvekirin, kiryarên terorîstî, û hwd. - belge kirine ku her yek ji wan binpêkirinên mafên mirovan ên giran nîşan dide. Ev kiryar ne bêserûber û ne jî sinûrdarin, lê îfade û belge bo pergalek siyasî û îdeolojîk in ku bi awayekî sîstematîk xelkê tepeser dike.

Dema ku dewlet rewatiya xwe bi dogmayên olî diyar dike, her dijberî tê krîmînalîzekirin, û binpêkirinên mafên mirovan dibin beşek yekgirtî ya pergala rêveberiyê. Ev nîşan dide ku xwezaya bingehîn a rejîmê bi prensîbên Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî re hev nagrin.

Di her pergalek demokratîk û însanî de, serwerî dizivire bo xelkê û xelk çavkanî û serçaveya sereke a desthilatdarîyê e. Sîstemên demokratîk li ser prensîba serweriya gel û serweriya hiqûqê ne, ku saziyên siyasî bi hilbijartina azad a welatiyan rewa dibin.

Berevajî vê, rejîma Îslamî ya Îranê, bi rêya sepandina desthilatdarîya melayan û girêdana navika wê pergalê bi tiştên dogm û metafîzîk ve, serwerîya xelkê ji holê rakiriye û mafê takekesî û mafê giştî yê xelkê bo serwerîyê pêpes kiriye û pêpes dike.

Ev tê vê wateyê ku gel di pratîkê de ji mafê diyarkirina pêşeroja xwe bêpar e. Dema ku dewlet xwe li ser "mafê îlahî" yê desthilatdariyê ava dike, welatî ji pêvajoya siyasî têne derxistin, û îradeya gel tê kêmkirin bo îtaetê.
Wekî din, avahiya rejîmê li ser cudakariya sîstematîk hatiye avakirin. Wekî ku Qasimlo destnîşan dike, Kurd tam ji ber nasnameya xwe ya netewî, daxwaza xwe ya demokrasiyê û girêdana xwe ya olî rastî dijminatiyê hatin.

Ev yek nîşan dide ku cudakariya li ser bingeha zayend, etnîsîte, ol û girêdana siyasî ne tenê kiryarên takekesî ye, lê mekanîzmayek girîng ya rejîmê ye. Jin bi bêparkirina ji mafên bingehîn ên li ser laşên xwe têne çewisandin û mdiberên siyasî bi girtin an mirinê re rû bi rû dimînin. Dema ku cudakarî hêza pêşvebirin ya pergalê be, eşkereye ku hebûna rejîmê bi xwe binpêkirinek daîmî ya mafên mirovan e.

Mafên merivan gerdûnî û bingehîn in ku her însanek bi hukmê jidayikbûnê wek însan, otomatîk dibe xwediyê wan mafan. Ji ber vê yekê ne maqûl e û nayê qebûlkirin ku ew bi "mafên olî" werin guhertin an jî ew li gorî îdeolojiyek taybetî werin binpêkirin.. Ji ber ku mafên merivan relatîf nîn in.

Ewa li demekê de ye ku ol û îdeolojî tiştek takekesî e û tak bi xwe biryar dide ka hilgirê kîyan ol yan îdeolojîyê be û nabe kom yan kesek were neçarkirin ku pêrewî li ol yan îdeolojîyek taybet bike. Ol û îdeolojî aîdî qada taybet a takekesî ne, tu dewlet an kom nikare bi rewa doktrînên xwe li ser tevahiya nifûsê ferz bike.

Danezana Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî, bi taybetî Bendên 18 û 19, mafê azadiya raman, wijdan û ol, û her weha mafê azadiya îfadeyê tekez dike. Ev prensîbên gerdûnî bi tundî berevajî hewldana rejîma Îranê ya ji bo destnîşankirina hemû mafan di çarçoveya "nirxên îslamî a xumeynîstî" de ne, ku mafên mirovan relatîf dike û bi vî awayî karakterê wan ê gerdûnî betal dike.

Rejîma totalîter û teokratîk a komara Îslamî a Îranê, ku mafên takekesî, azadiya derbirînê, wekhevî, xwebirêvebirinê nas nake, ji ber vê yekê binpêkirinek ducarî temsîl dike: hem bi kiryarên xwe yên berbiçav û hem jî bi hebûna xwe wekî sîstemek.

Rejîm bi xwe binpêkirinek mafên mirovan e. Dema ku dewlet li ser prensîbên ku serweriya gel û mafên gerdûnî binpê diki were avakirin, hebûna rejîmê bi xwe dibe gef li ser azadiya mirovan.

Ev berpirsiyariyek giran dixe ser her takekesî, li ser neteweyên bindest ên Îranê û li ser civaka navneteweyî ku ji ber wan erkê exlaqî û siyasî pêşî li zilm û zordariya bêtir bigirin û ew yek jî bi nemana rejîmê pêk tê. Bêdengiya li hember pergalên weha dibe alîkar ku wan rewa bikin

Bêyî vê rejîmê, azadî dê mezintir, ewlehî û aramtî berfirehtir û mirovahî dê bêtir parastî be - ne tenê li Îranê, belkî di heman demê de li herêmê û cîhanê jî. Ji ber vê yekê rûbirûbûna bi rejîmê re ne tenê meseleyek siyasetê ye, belku meseleyek berpirsiyariya hevpar a mirovahiyê ye.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê li girtîgehên xwe de 10 girtiyên din jî bidar vekirin



Pêka dawî raporên belavbûyî roja Şemî 29ê Xermananê, kesek ku nav û nasnavê wî nehatiye zanîn li girtîgeha rêjîmê li bajarê Melayêrê û girtiyek ê bi navê "Elî Mensûrî", li girtîgeha rêjîmê li bajarê Tewrêzê de hatiye bidarvekirin.

Li roja 26ê Xermananê jî "Xefûr Bêhbûdî" û herwisa girtiyekî Efxanî yê bi navê "Ebdulselam Mîr Pêncşîr" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Taybadê, "Mîsaq Rizayî û Muhsin Yêgane" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Simnanê, "Mêhrdad Tacîk" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Şîrazê û "Mihemed Ferşasd Borekzêhî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Gunabadê de hatine bidarvekrin.

Li roja Sêşemî 25ê Xermananê jî "Xulamriza Herîrî û Nê`imet Xudabexş" li girtîgeha rêjîmê li bajarê "Sarî"yê de hatine bidarvekirin.

Bi wî awayî li destpêka heyva Xermananê heta roja Şemî 29ê Xermananê, zêdetir ji 172 haletên bidarvekirin li girtîgehên rêjîmê de hatine tomarkirin, lê amara serast gelek ji vê rêjeyê zêdetir e.

## Kasibkarekî xelkê bajarê Pîranşarê ji aliyê hêzên rêjîmê ve hate kuşt



Pêka raporên belavbûyî, li roja Şemî 29ê Xermananê "Çiya(Xidir) Ehmednijad", kasibkarê temen 42 salî yê xelkê bajarê Pîranşarê li encama teqeya rastetast a hêzên çekdare rêjîma Îranê de hate kuştin û wan hêzên hov piştî kuştina wî welatiyê Kurd, termê wî bi cî hiştine ku piştî çendîn demjimêran ji aliyê xelkê deverê ve hatiye peydakirin.

Pêka wan raporan, hêzên hov ên rêjîmê bi şika hebûna tiştîn qaçax li pey wî kasibkarî kevtine û li nêzî gundê Zêwiye de li mewdaya nêzîk ve teqe li navbirî kirine û 3 gulleyên şer bi wî kasibkar kevtine û hatiye kuştin.

Navbirî ku bavê 3 zarokan e, li dema kuştinê de ti alav an tiştek qaçax nebûye û piştî peydakirina termî wî, li hemen rojê de li demjimêrên piştî nîvro, bi axê hatiye spartin.

## Binçavkirina nûgihanan li Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê rêjîmê ve berdewam e



Roja 27ê Xermanan a 1404 a Rojî, li gundê "Sîngan"ê ser bi bajarê Şinoyê, nûgihanekî temen 17 salî yê bi navê "Zanyar Şadîxa", kurê "Hemîd" û herwisa civanekî din ê bi navê "Muhsin Dehar" temen 24 salî kurê Silêman, ji aliyê hêzên hov ên îtilaata rêjîmê ve hatine binçavkirin.

Gorî rapor û zaniyariyan, hêzên hov ên îtilaata rêjîmê, bê belgeya yasayî û bi awayê xoserane êrîş kirine ser mala wan 2 welatiyan û ev binaçv kirine.

Herwisa roja Çarşemî 26ê Xermananê jî, 2 nûgihanên temen 16 salî yên bi navê "Diyar Gergul û Alan Tabnak" bi hemen şêwazê hatibûne girtin û vê pêkê rêjeya nûgihan û ciwanên binçavkirî li çend rojên derbasbûyî li bajarê Şinoyê, gihîşte 4 kesan ku heta niha sedema binçavkirin, tohmetên sepandî û cihê ragirtina wan nexuya ye.

Herwisa qedera 6 zarokên temen 16 û 17 salî, yên bi navên "Kawan Sebûrî, hewraz Zemanî, Bêhrûz Reşîdî, Soran Muzeferî, Peyam Hesenî û Îhsan Sebûrî" xelkê bajarê Kamêranê ku ji aliyê hêzên hov ên rêjîmê, nêzî heftiyek berî niha hatibûne binçavkirin, bi nerohnî maye û ti zanyariyek serast li derheq sedema binçavkirin, tohmetên sepandî û cihê ragirtina wan li ber dest nîne.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (502)